SEFER

Mehfoz Mayî

Min çi cara
Li ser pişta perêt ewra
Geşt û sefer nekirbûn
Lê pa nuke..
Ho bîrhatina şirîn
Hero pêlek ji vî ewrê biyanî
Min digel xweda radiket û

Sefer dikim..
Dema ku ez bilind dibim
Êsî çiya bilind nabe û
Ez meziniya wî nabînim
Ez bilindiya wî nabînim
Dema ku em dûr difirîn
Çavên şînên deryayê jî

Wenda dibin
Pêlên avê jî dixendiqin
Dema ez û ewir
Hêj dûrtir û dûr difirîn
Dorge û oqyanûsa dibirîn
Derya şîn û spî û reş dibirîn
Dûr diçîn û derbas dibîn
Ji nişkave..
ji wê derê
Hemî çiya
Ji min û ewran
Gelek... gelek bilindtir in
Çavên şînên deryayê jî

Di nîva Gola wanê da
Gelek... gelek
Ji ciwaniyê ciwantirin
A li wê derê
Ewir kerba xwe dimire û
Ez jî hêdî
Digel sivke dilopa baranê
Peya dibin û
Li nav gundê pişta Girî
Li ser axê
Şûnpêlava
Dayika Helîme maçî dikim